Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1002 | 4-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Ji Helebê re dibistaneke din a Kurdî

**3 dibistanên li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê deriyên xwe ji bo pêşwazîkirina xwendekaran vekirin. Di wan dibistanan de materyalên Rêveberiya Xweser bi zimanên Kurdî û Erebî tên xwendin. Her wiha ji bo xwesteka zêde ya gel, dibistana 4'an jî tê vekirin.**

Li gorî biryara Desteya Perwerde



û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, 3 dibistan ji bo perwerdeya bi materyalên Rêveberiya Xweser li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin vekirin û destpêka sala nû ya 2022-2023'yan xwendekar pêşwaz kirin.

Dibistana yekemîn, Dibistana Şehîd Qehreman a Seretayî ye. Sala 2018'an hate vekirin û li rojhilatê taxa Şêxmeqsûd e, ya duyemîn jî bi heman navî ye; dibistana perwerdeyê ya navîn û amadehî ye û li heman aliyê taxê ye û di 2019'an de hate vekirin. Dibistana sêyemîn jî, Dibistana



Şehîd Avaşîn Demhat e û di 18'ê Îlona îsal de hate vekirin. Dibistan li Şiqeyêf a Helebê ye, tê de 3 qonaxên xwendinê; seretayî, navîn û amadehî hene.

**Li her sê dibistanan nêzî 300 xwendekaran hene. Hejmara mamosteyan jî 37 e.**

Her pêkhateyek li her sê dibistanan bi zimanê xwe yê dayikê di refa yekemîn û duyemîn de dixwîne. 3 waneyên zimanê Kurdî di hefteyê de ji pêkhateya Ereb re û 3 waneyên zimanê Erebî di hefteyê de ji pêkhateya Kurd re tên dayîn. Ew jî di refa sêyemîn a seretayî de dest pê dike. Waneyên zimanê Ingilîzî jî ji refa 5'an de dest pê dikin.

Têkildarî mijarê mamoste Medîne Mihemed dibêje, "Em hemû waneyan li gorî materyalên Rêveberiya Xweser didin. Em bawer dikin ku em dikarin nifşekî rewşen û zana bigihînin."

Îsal jî pênûs, lênûsk, çente û pirtûk bê pere li xwendekaran hatine belavkirin.

Endama rêveber a Dibistana Şehîd Qehreman Efrîn, Xedîce Gedro jî dibêje "Em bi gavên sabît bi pêş ve diçin û her salê gavên nû diavêjin. Me bi qonaxa seretayî dest pê kir, bi wê re em derbasî qonaxên navîn û amadehî jî bûn. Me xebata vekirina dibistaneke din jî da destpêkirin. Ji ber ku hejmara xwendekaran zêde ye. Wê jî hişt em îsal dibistaneke din vekin."

Zarokên li van dibistanan dixwînin, bi pirranî ji ber ku ders bi Kurdî ne, tercîh dikin. Malbatên wan jî bi pirranî ji ber heman sedemê razî ne zarokên wan diçin van dibistanan.-***Ozgurpolitika***

# Ji ronahiya çav û wêdetir zeraqên UV

**Dema meriv li ser wêneyên Cody Cobb dihizire, bivênevê meriv difikire û dibêje, gelo li dinyayê çiqas tiştên din hene ku çavên me wan nabînin.**



Wênegirê bi navê Cody Cobb bi wêneyên xwe yên ku bi rêya "Zeraqên UV" (Zeraqên ji binefşî û wê de) digire hin dîmenên ku çav nikarin bibînin, ango hin tiştên veşartî derdixe holê. Çavên insanan di navbera 400 û 700' nanometre de dikare hin tiştan bibîne û jê zêdetir nikare bîbîne. Lê zeraqên ultraviyole di navbera 100 û 400 nanometreyî de ne û çav nikare wan bibîne. Jixwe, jê wêdetir jî "zeraqa X" hene ku bi ti awayî meriv nikare wan bibîne û di wan têbigihîje.

Piştî Cody Cobb bi zeraqên UV çend ceribandin kirin, dît ku encamên balkêş derdikevin holê. Wî li Las Vegasa Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) hin menzereyên ku berê xelkê dîtine, bi awayekî din nîşan dide ku berê ti kesî bi vî awayî nedîtine. Ji bo karibe van wêneyan bigire, bi saetan li benda wêneyekî disekine ji lewra ew mecbûr e bi pozên dirêj wêneyan bigire. Lê encama ku ew bi dest dixe, hêja ye mirov li bendê be.

Cody Cobb ji bo vî karê xwe yê zehmet ê ku gelek wext lê diçe, dibêje, "Bi riya zeraqên UV ez menzereyê çiqas kifş bikim, ewqas kêfxweş dibim û çawa ku li dinyayeke din bim, xwe wisa hîs dikim. Ji bo ez fêr bibim zeraqên UV reaksiyonên çawa didin, min gelekî serê xwe êşand. Lê ezmûneke baş bû."

Dema meriv li ser wêneyên Cody Cobb dihizire, bivênevê meriv difikire û dibêje, gelo li dinyayê çiqas tiştên din hene ku çavên me wan nabînin.


***-Ozgurpolitika***

# 'Ji ber rêgiriya Tirkiye û Îranê ji sedî 80'yê ava Herêmê kêm bûye'

**Serokê Beşa Şaristanî li Zanîngeha Komar Ako Reşîd, diyarkir ji ber rêgiriyên welatên cîran (Tirkiye, Îran) ji sedî 80'yê ava Herêmê kêm bûye. Ako got, avên binerd jî bi rêjeyek berbiçav kêmbûye û diyarkir ger berê bîrek avê di 200 metran de derdiket, niha di 750 metran de av derdikeve.**



Derbarê qutkrina avê ji aliyê Tirkiye û Îranê ve li ser Herêma Kurdistan û Iraqê her wiha metirsiyên wê, Serokê Beşa Şaristanî li Zanîngeha Komar Ako Reşîd ji Rojnews re axivî.



Ako Reşîd got, "Sedemê sereke yê kêmbûna avê li Iraq û Herêma Kurdistanê, çêkirina bendavan a ji aliyê welatên cîran ve ye ku li ser çavkaniyên ava Iraqê çêdikin. Ji berku ji sedî 70'yê çavkaniyên me yên avê ji derve de tê. Sedemek din qirêjbûna jîngehê û xirab bikaranîna avê ye."

Derbarê bandorên ku rêgiriya avê bi xwere anîne jî Ako Reşîd wiha axivî; "Ji ber girtina avê ji aliyê welatên cîran ve, nêzî ji sedî 80'yê ava Herêma Kurdistanê kêm kiriye. Avên binerd jî bi rêjeyek berbiçav kêmbûye. Ger berê bîrek di 200 metran de av derdiket, niha di 750 metran de av derdikeve."

***-ROJNEWS***

Sudoku:Pirs 11

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 2 | | | 1 | | 6 | | |
| | 8 | | | | 2 | | | 7 |
| | | 6 | 9 | | 7 | | | |
| 5 | 7 | 9 | 2 | | | | | |
| | | 8 | 7 | 9 | 3 | 5 | | |
| | | | | | 8 | 7 | 9 | 4 |
| | | | 6 | | 5 | 1 | | |
| 2 | | | 8 | | | | 4 | |
| | | 5 | | 3 | | | 2 | |

Sudoku: Bersiv 10

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | 9 | 4 | 1 | 8 | 2 | 3 | 7 |
| 8 | 7 | 3 | 2 | 6 | 5 | 1 | 9 | 4 |
| 1 | 4 | 2 | 9 | 7 | 3 | 6 | 5 | 8 |
| 5 | 8 | 4 | 7 | 2 | 9 | 3 | 6 | 1 |
| 2 | 9 | 6 | 3 | 4 | 1 | 7 | 8 | 5 |
| 3 | 1 | 7 | 5 | 8 | 6 | 9 | 4 | 2 |
| 7 | 2 | 5 | 6 | 3 | 4 | 8 | 1 | 9 |
| 9 | 6 | 1 | 8 | 5 | 2 | 4 | 7 | 3 |
| 4 | 3 | 8 | 1 | 9 | 7 | 5 | 2 | 6 |

# 'Pêwîste her jinek bibe çirûska serhildanê'

Fermandara YPJ'ê Dilovan Gever diyar kir ku fikrê Rêber Apo çavên jinan ji nûve vekir û got, slogana jinên tolhildêr 'JIN JIYAN AZADÎ' wê bibe qîrîna tevayiya jinan û di guhê desthiladaran de bimene.***R-5***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1002 | 4-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# '160 ROJAN BINGEHA SERKEFTNA MEZIN DANÎ'

***Fermandarê Biryargeha NPG'ê Mûrat Karayilan diyar kir ku berxwedana 160 rojên ya derbasbûyî, bingeha serketina mezin daniye û got, kesên ku ewqas berxwedanî dikin ne gengaze ku bisernekevin.R-4***




## Qêrîna edaletê ya 575 rojan



Malbata Şenyaşar ew 575 roj in ji bo edaletê di nobedê de ye û êdî malbat dibêje, ji ber ku edalet nîne, zilm dewam dike. Lê di dîrokê de ti pergal bi zilmê li ser piyan nemayîne.***R-3***

## HPG : 10 leşkerên dagîrker yên artêşa Tirk hatin cezakirin




HPG'ê diyar kir ku di 8 çalakiyên gerîlayên azadiya Kurdistanê de,10 leşkerên dagirker ên artêşa Tirk hatine cezakirin û got, artêşa Tirk ya dagirker Qadên Berxwedanê 31 caran bombe kiriye***R-3***

## Pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î`



Bi armanca hişyarkirina jina li ser nexweşiya penceşêra sîngê, Komîteya Tenduristiyê ya Weqfa Jina Azad ya Sûriyê 1`ê vê heyvê li bajar û gundewarên kantona Qamişlo dest bi pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î" kir.***R-2***

## Şaredariya Hesekê berdewamiya xebat û projeyên 2022`yan dike



Selwa Silêman da zanîn ku tevî derfetên kêm û êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker li ser herêmê, xebata wan ya xizmetguzariyê berdewam e û got, emê hewl bidin tevayiya projeyên xwe di dawiya salê de bi dawî bikin. ***R-7***

## Rewşa Rojhilata Navîn, encamê hişmendiya zilamê serdest e

Ji ber ku Dewleta Tirk ya dagîrker pêşengiya zihniyeta zilamê serdest dike, li hemû qadên ku lêgerîna azadiya jinê lê heye, hêzekî çete ava dike û hewil dide îradeya jinê têk bibe.

***Ji qelemê Jînda Rustem***

# Pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î`

Bi armanca hişyarkirina jinan li ser nexweşiya penceşêra sîngê, Komîteya Tenduristiyê ya Weqfa Jina Azad ya Sûriyê 1`ê vê heyvê li bajar û gundewarên kantona Qamişlo dest bi pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î” kir.

Darîn Silê/Qamişlo

Ji ber ku ev heyv bi heyva penceşêra sîngê an jî bi heyva gulîn tê nasîn, her sal di vê heyvê de Weqfa Jina Azad bi pêngavekê ji bo penceşêra sîngê radibin. Niha hî dest bi Pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î` kiriye û wê ev pêngav heta dawiya vê heyvê berdewam bike. Di pêngavê de dê semînerên hişyarkirinê ji tevayiya jinên bajar û gundewarên Qamişlo re bê dayîn. Derbarê destpêkirina pêngavê û hişyariyên li ser nexweşiya Penceşêra sîngê, rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Melka Hesaf ji me re axivî û behsa sedem û nîşanên vê nexweşiyê kir.

### `Divê jin tenduristiya xwe paşguh nekin`

Melka Hesaf da zanîn ku penceşêra sîngê di nava jinan de pir belavbûye û axaftina xwe wiha domand: “Di dema dawî de li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, penceşêra sîngê zêde bûye. Heta niha nêzî sedê 15 jin bi nexweşiya penceşêra sîngê ketine. Gelek jin jî hene pê dikevin, lê ji ber ku li xwe napirsin, pê dernaxin ku nexweşî bi wan re heye. Gelek jê jî newêrin li xwe bipirsin, lewra ji nexweşiyê ditirsin. Ev jî dibe sedema ku nexweşî li wan girantir bibe û bi awayekî zû jê rehet nebin. Ji bo wê jî divê her




dem jin li xwe bipirsin û tenduristiya xwe paşguh nekin, bi taybet li pêsîra xwe bipirsin. Lewra çiqas mirov nexweşiya xwe paşguh bike, ewqas çareseriya wê nexweşiyê zehmet dibe.”

Melka Hesaf di berdewamiya axaftina xwe de got, jinên ku girêk di pêsîra wan de çêbibe, divê yekser li xwe bipirsin. Da ku nas bikin ev girêk ya pîse yan jî ya saxlem e. Lewra ne tevayiya girêkan yên pîsin, hin girêk hene neyên nexweşiya pençeşêrê ne.

### Sedemên derketina nexweşiya penceşêra sîngê

Melka diyar kir ku gelek sedemên derketina nexweşiyê hene û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Sedemên vê nexweşiyê ev in: ‘dema ku di malbatê de wîraseta nexweşiya kanserê hebe, jinên ku ji pêsîrê şîr nadin zarokên xwe, yên wezna wan zêde û zewaca di temenê piçûk de’.”

### Nîşanên penceşêra sîngê

Melka behsa nîşanên vê neweşiyê jî kir û wiha pê da çû: “Hin nîşanên nexweşiya penceşêra sîngê hene, dema jin van nîşanan bibînin pêwîste zû li xwe bipirsin û pêsîra xwe venêrîn bikin. Nîşan jî ev in: ‘Girêka (melmos), mezinbûn û biçûkbûna pêsîrê, dema cihin ji çerm rengê wê sor dibe û cihin jê dibe wek cermê şewitî’.”

### `Armanc, hişyarkirina jinan li ser penceşêra sîngê ye`

Melka got, ji bo hişyarkirina jinan li ser penceşêra sîngê 1`ê heyvê me dest bi pêngavekê kir û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Her sal em bi pêngavên wisa radibin. Armanca me ji pêngavê ew e ku tevayiya jinên me nexweşiya penceşêra sîngê nas bikin û jê hişyar bin. Jixwe di pêngavê de emê




semînerên li ser sedem û nîşanên nexwşiyê û bi taybet hişyariyên li ser vê nexweşiyê bidin jinan. Da ku karibin parastina xwe bikin û ha ji tenduristiya xwe hebin. Ji bilî wê jî, emê jinên ku nexweşiya pençeşêrê bi wan re heyî kom bikin û semînerên ji bo xweşkirin û geşkirina derûniya wan bidin. Herwiha emê hêza wan xurttir bikin.”

### `Divê hêza jinê ji nexweşiyê xurttir be`

Rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Melka Hesaf di dawiya axaftina xwe de got, em bihêvî ne ku her demê jin li xwe bipirsin. Herwiha jinên ku nexweşî biwan re heyî, bila teslîmî nexweşiyê nebin. Li çûna ku derûniya xwe lawaz bikin, divê hêza xwe ji nexweşiyê xurttir be.

## Rewşa Rojhilata Navîn, encamê hişmendiya zilamê serdest e



Jînda Rustem

**Ji ber ku Dewleta Tirk ya dagîrker pêşengiya zihniyeta zilamê serdest dike, li hemû qadên ku lêgerîna azadiya jinê lê heye, hêzekî çete ava dike û hewil dide îradeya jinê têk bibe.**
Êrişên ku bi giştî li ser Rojhilata Navîn û bi taybet li ser Kurdistanê tên kirin, di serî de jinê dike armanc. Ev jî di êrişên faşîzma Tirk yên ser bakur, başûr û Rojavayê Kurdistan, herwiha êrişên rêjîma Îranê yên ser jinên Rojhiêlatê Kurdistanê li Îranê bi awayekî zelal tê dîtin. Herwiha tu cûdahiya hikumeta Şamê û ya Iraqê, ji ya Tirkiyê û Îranê tine. Dema hikûmeta Şamê li ser xwe bû, rewşa jinê li Sûriyê pir xerab bû, dema niha tevî ku kirîza Sûriyê 11 sal li du xwe hiştin jî, lê hişmendiya hikûmeta Şamê ya li dijî hebûna jinê nehat guhertn.
Ji ber ku rêjîmên deshilatdar yên wekî Tirkiyê, Îran, Sûriyê, yasayên qedexekirina şideta li ser jinê dernaxin û hêza wan ya pêkanîna vê jî, tune ye. Ji ber ku zihniyeta sîstema wan bixwe li dijî jinê ye.
Rêber Apo diyar kiriye ku pirsgirêka sereke ya Rojhilata Navîn, pirsgirêka jinê ye, ku hemû pirsgirêk bi wê dest pê dikin û çareseriya tevayiya pirsgirêka ne.
Niha rastiya ku Rêber Apo diyar kiriye, em di pratîkê de jî dibînin.
Di tevayiya Rojhilata Navîn de, tenê jin dikare hêzêk rêxistinbûyînê ya şoreşgerî ava bike û eger di civakê de guhertinek çê dibe, ew bi pêşengiya jinê ye.
Bûyera Jîna Emînî yek ji wan bûyrên ku bûne sedema serhildanên şoreşgerî, ku li tevayiya Rojhilatê Kurdistan û Îranê bilav bûne.
Bûyerên bi vî rengî berê jî qewimîne, ji wê demê heta hêzên desthilatdar yên Îranê ti fikirandina wê nîne ku dest ji faşîzmê berde.
Eger ev desthilatdar derfetê bibîne, wê faşîzma li dijî jinê zêdetir bike.
Di serhilanên Îranê yên niha de, rêjîm bê hisab êrişî xwepêşanderan dike û çekan li dijî wan bikar tîne, yên ku tên hedefgirtin jî, teybet jinin.
Jîna Emînî keçeke Kurd bû, kesayetyeke serbilind û ji xwe bawer bû. Êrişa rêjîma Îranê ya li dijî wê, li dijî kesayeta jinên ji xwe bawer û bi biriyar bû. ji ber ku desthilatdar nikare jineke xwedî îrade tehemûl bike.
Di demên bûrî de rêjîma Îranê gelek jin işkence û bidarve kirin.
Rêjîma Îranê kuştina jinê di bin navê qanûnan de pêk tîne. Lê li Tirkiyê bûyerên li dijî jinan ne di bin navê qanûnê de tên kirin, di bin navên cûda tên kirin. Li Tirkiyê bêhelwestiya li hemberî bûyerên li dijî jinê, hiştiye ku şideta li ser jinê dehqat zêdetir bibe.
Di pêvajoya niha de, jin li Rojhilata Navîn di aloziyekê mezin re derbas dibe. Mînaka wê jî Arebistana Sûdî ye û tevaiya tiştê di bin navê islamê de li ser jinê hatiye ferizkirin pêk tîne. Herwiha Qeter ku nûçeyên li ser şideta li dijî jinê yên li dewletên derdorê pêk tê, di ragehandina xwe de belav dike, lê tu mafê jinê di qanun û pratika wê de nîne.
Li Rojhilata Navîn xetera li dijî jinê pir zêde ye û ti rejîmên dewletan guhertin di zihniyeta li dijî jinê de çênekirine. Tevaiya Rojhilata Navîn di pêvajoyeke pir tevlihev de ne. Lê di vê pêvajoyê de, cara yekemîn jin bi şêwazê rêxistinkirî , bi şêwazê ku karibe dengê xwe derxe, xwedî li mafê xwe derkeve, xwe rêxistin dike. Ev isbat dike ku şoreşa Jinê li Rojhilata Navîn dest pê kiriye, ev jî bi pêşengiya jina Kurd çêbûye.
Jina Kurd di her çar perçeyê Kurdistanê de, di hêla Hişmendî de hişyarbûnekê jiyan dike. Jiyana bindestiyê ji bo xwe qebûl nake, xwedî îrade û helweste; di milê leşkerî de jî xwedî roleke girînge û dizane çawa hebûna xwe biparêze.
26 îlonî li Mêrsînê, li dijî dagîrkeriya Tirkî çalakiyek hat lidar xistin. Ew çalakî ji aliyê du şervanên qehraman yên fedayî hat kirin. Şehîd Sara û Şehîd Rûken bi xwe li dijî dagîrkeriya Tirk çalakiyek bibanor li dar xistin. Tevaiya dewletên NATO yê destekê didin Tirkiyê ji bo du armancan; ya yekê qirkirina gelê Kurd yê berxwedêr e, ya din jî têkbirina hêza jinê li Rojhilata Navîn e. Dewleta Tirk ya dagîrker, li hemû qadên ku lêgerîna azadiya jinê lê heye, hêzekî çete ava dike û hewil dide îradeya jinê têk bibe. Li Lîbyayê dema jinên lîbî xwestin xwe birêxistin bikin, Tirkiyê destek da hêzên çete û li dijî îradeya jinan sekinîn. Li ku derê çirûska xwerêstikirina jinan hebe, Tirkiyê li wir hêzeke çete ava dike û li dijî hebûna jinê kar dikin.
Herwiha ji dema avabûna cimhûriyeta Tirkiye de heta niha, tu hikûmetan wekî AKP’ê dijminatiya jinê nekiriye, li ser destê hikûmeta AKP’ê jin hatin hedefgirtin.
Rewşa aloziyê li Rojhilata Navîn, encamê rewşa hişmendiya zilamê serdest e. Li hember wê jina xwerêxistikirî, di armancê xwe de zelal e û pir bi hêrse. Dîmenên çalakiya heval Sara û heval Rûken mirovan dihejîn e. Dema em li vê pêvajoyê binêrin, em dibînin li welatê ku herî dengê jin hatiye qedexekirin wekî Tirkiyê û Îranê , jinan xwe birêzxistin kiriye. Ev jî tê wê wateyê ku bi rêya xwe rêxistinkirin û tekoşina jina kurd wê şoreşa azadiya gelên Rojhilata Navîn pêk bîne.



# ’Wênesazî riya vegotina hestê mirova ye’

Wênesaz Ciwan Nibiş diyar kir ku Wênesazî cîhana mirov ya hundir e û got, ez bi evîndariyekê mezin bi xêzkirina wêneyan ve hatime girêdan û roj bi roj hiskirina min ji wênesaziyê re zêde dibe.

Mihemed Xanim / Qamişlo

Di jiyana her mirovan de hunera xeyal û xewnên zarokatiyê heye. Li gorî wê xeyalê dibe xwedî pîşe û kar. Lewra bi xwesteka dilê mirovan û israra karê xwe hêdî hêdî dibe xwedî berhem û huner. Ew huner bi evîndarî belav dibe. Di hindirê her mirovekê de cîhanek heye. Ev cîhana mirov her dem di nava lêhûrbûnekê de ye. Lewra yek ji berhemên ku di nav civakê



û cîhanê de belavbûyî hunera wênesaziyê ye. Hûnera Wênesazî, dîrokekê pir dirêj heye. Em dikarin bêjin mirovahiyê bi xîzkirina jiyana xwe, derdorê xwe, bûyer û çanda xwe hem danasina serdema xwe kiriye hem jî hunera wênesaziyê afirandin ye. Her wiha hest û ramanên xwe derxîstine hole. Li ser bingeha wê mirovan kariye di roja me ya îro de jî bi tabloyên xwe hêstên ku jiyan dike bi civakê re parve bike û peyamên xwe bi vê rêyê digihînin civakê. Di lêvegera lêkolînên dîrokî de tê payîn ku, hunera wênesaziyê dîroka wê vedigere 20 hezar sal a beriya zayinê. Bi kurtahî bi armanc be, ne bi armanc be mirovên her serdemekê bi bi xîzkirina wêneyan danasîna jiyan û hebûna xwe, çand û civaka kirine û di dîrokê de jî mayînde kirine; ev hûnere bûye şêvazekî parastina dîrok, çand û hestên civakan.

### ’Wênesazî xeyala min ya zaroktiyê bû’

Yek ji wênesazên ku em rastê wî hatin Ciwan Nibiş e, bi hest û ramanên kur di wêneyên xwe de gelek çîrokan vedibêje û rastiya civaka xwe derdixe holê.
Ciwan di sala 1989’an li gundê Dimlya yê girêdayî Kantona Efrînê ji dayîk bûye, xwendina xwe ya seretayî û navîn li gundê xwe qedandiye. Xwendina qonaxa amadeyî jî, li bajarê Efrînê bidawî kiriye. Pişt re li zanîngeha Helebê dest bi xwandina beşa huqukê kiriye lê, ji ber şerd û mercên jiyanî dest ji zanîngehê berdaye û lêbelê dest ji xeyalên xwe yên zarokatî bernada û wênesaziya xwe pêş xist.
Şêwekar Ciwan ku ji Kantona Efrînê ye, çîroka xwe ya wênesaziyê ji rojnameya me re vegot.
Ciwan di destpêka axaftina xwe de diyar ku ew ji zarokatiya xwe de ji vê hunerî hes dikir û çiqas ev hûnera xwe pêşxist, heskirina wî li ser vê hûnerê xurttir bû.
Ciwan da zanîn ku Ji ber ku ewî bi hûnera xwe dibistan û xwandevanên dibistanê hemû hemêz kiribûn, mamosteyên wî yên qonaxa seretayî jê re digotin, ‘Wênesazê Dibistanê’.
Ciwan li ser hûnera xwe wiha got: “Di dibistanê de heyecana min a waneya wênesaziyê, pir zêde bû û ez her tim li benda saeta waneya wênesaziyê bûm, da ku ez wêneyekê saz bikim. Lê tevî jêhatîbûna min ya di wênesaziyê de jî, ne mamosteyên min, ne jî malbata min piştgiriya min dikir. Tenê ji min re digotin, ‘baldarê xwendina xwe be, wênesazî bê sûde!”

### ’Heta li ser kevirên gundê xwe jî min wêne xêz dikirin’


Ciwan ji ber hezkirina xwe ya ji wênesaziyê re li ser dîwarê mala xwe , lênûs, pirtûkan û hin caran li ser kevirên gund yên mezin jî, wêne xêz dikirin .Di destpêka fêrbûna wênsaziyê de, wî bi pênûsa resas wêne xêz dikir û di temênê 13 salî de jî bi xwelîyê, wêne saz dikir.
Ciwan diyar kir ku bêyî alîkariya ti kesî, wî rengên avî bikar anîn, asta wî bi dem re pêş ket û di xêzkirina wêneyan de bû pispor.

### ’Wênesaz bi xêzkirinê hestên xwe vedibêje’

Ciwan behsa wênsaziyê kir û wiha got: “ Berhemên ku mirov pê re ked dide pîroz û xwedî wate ne. Wekî beşeke hunerê, wêne jî yek ji wan berheman e ku hestê mirovekî, li ser çarçoveyekê dide xuya kirin. Dema mirov li wêne binêre, hestê wênesaz di nava xêzên wêneyê de, xwe vedibêjin.”
Wênesaz Ciwan diyar kir ku heskirina wî ya xêzkirina wêneyan, derketiye asta evîndariyê û got, her mirovek bi taybetmendiyên xwe dixwaze li gorî hest û ramanên xwe jiyanê, rastiyê û cîhana xwe



ya hundirîn derxe holê. Ez jî bi hunera xwe ya wênesaziyê jiyana xwe vedibêjim û di tableyên xwe de rastiya jiyana civaka xwe, diraxim ber çavê cîhanê.
Wênesaz Ciwan Nibiş da xxuyakirin ku ewê her tim xêzkirina wêneyan dewam bike û axaftina xwe wiha



qedand: “ Her çiqas diçe hiskirina min ji wênesaziyê re zêde dibe. Ev bûye parçeyekê jiyana min û di her kêliya jiyana min de wê ev hûnera min bidome.”

Hêjayî gotinê ye ku Ciwan Nibiş di dema niha de di rewş û zehmetiyên koçberiyê de, wêneyên Bortirê û Rasteyî xêz dike û li ser xêzkirina wêneyên kesayetan dixebit e.

# Di Festîvala Fîlmên Jinan de li ser pirtûkên jinan hat nîqaşkirin

**15’emîn Festîvala Fîlmên Jinan a Navneteweyî ya Salê ku ji aliyê Komeleya Bouregreg ve bi piştgiriya Meclîsa Kolektîf a Bajarê Salê ya Mexribê tê lidarxistin, wê 1’ê Cotmehê roja Şemiyê bi dawî bibe.**

Festîvala Fîlmên Jinan a Navneteweyî ya Salê bi du riyên cuda ji bo du nivîskarên Mexribî, endezyar Yasmîna El-Sibêhî, bi pêşkêşkirina pirtûka xwe ya “Mesar El-Weliyat El-Salîhat Bil Mexrib” û çalakvana jîngehparêz û nivîskar Hesna Şehabî re bi romana xwe ya “Zehret El-Larenc” pîroz kir.




### “Pênûsa jinan pênûseke afirîner a pir taybet e”

Hesna Şehabî da zanîn ku romana wê ya bi navê “Zehret El-Orenc” gera jinan e ku di nav riyên gotin û ziman de ji bo rizgariyê û razên bedenê digerin û wiha got:
“Romanek e ku dîroka bêedaletî û zilma ku di van salên dawî de li ser jinan hatiye kirin di lêpirsînê re derbas dike, ji ber ku mal bûne qada tecawiz û tacîzê ku qurbaniyên wan jin bûne. Jin di romanê de li dijî pîvan û kevneşopiyan serî hildidin ji desthilatdariya baviksalarî dûr dikevin. Pênûsa jinan pênûseke afirîner a pir taybet e.

### “Dibistanên kevnar ên ku jinan ava kirine hene”

Endezyar Yasmîna El-Sibêhî diyar kir ku pirtûka wê ya bi navê “Mesar El-Weliyat El-Salîhat Bil Mexrib” bi Fransî hatiye çapkirin û wiha pê de çû: “Wergera Erebî ya pirtûka min dê di demek nêzîk de were çapkirin û bi navê ‘Esrar û enfas weliyat sûs û fas’ were çapkirin. Asoyên nû li ber min hatin vekirin hiştin ku ez pirsgirêkên civakê bi taybetî jî pirsgirêka jin û ciwanan fam bikim. Divê ku em xwe bi nirxên estetîk û manewî, hezkirin û toleransê dagirin da ku van ceribandin û zehmetiyên cîhan di dema niha de tê re derbas dibe derbas bikin. Hezkirin bingeha hebûna mirovan e, ji ber ku ew çekek bi hêz e dikare li hember her cure cudakarî, bêhevsengî, kîn û şerên ku mirov li her çar aliyên cîhanê li dijî birayên xwe dimeşîne, bisekine. Jin di

perwerdekirina mirovan de roleke pir mezin lîstine lê di dirêjahiya dîrokê de tu kesê behsa rola wan nekir. Ez bang li ciwanan dikim ku vegerin perwerdeya giyanî û lênihêrîna mîrasê, ji bo kêmkirina diyardeya xwekujî û narkotîkê.”
***Nûjinha***

# Şaredariya Hesekê berdewamiya xebat û projeyên 2022`yan dike

Selwa Silêman da zanîn ku tevî derfetên kêm û êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker li ser herêmê, xebata wan ya xizmetguzariyê berdewam e û got, emê hewl bidin tevayiya projeyên xwe di dawiya salê de bi dawî bikin.

**Darîn Silê/Hesekê**

Di şoreşa Rojava de bi avakirina Rêveberiya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê, Şaredariyên gel jî hatin avakirin, yek ji van şaredariyan Şaredariya Gel ya Kantona Hesekê ye ku sê Şaredarî û du



navendên xizmetguzariyê (Şaredariya Safiya, Twêna, Til bênder, navenda Til Tewîl û ya Red Şeqra) girêdayî wê ne. Şaredariyê di warê pêşxistina xizmetguzarî û aboriya civakê de gelek kar û xebatan daye meşandin û bi awayekî aktîf projeyên biçûk û mezin pêk aniye. Herwiha bi pêkanîna projeyan hewl dide xizmetguzariyê li herêmê pêş bixe û xurttir bike. Niha jî tevî rewşa awarte, êriş û kiryarên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, xebat û projeyên xizmetguzariyê yên sala 2022`yan dewam dike û dibe bersiva êrişên dagîrkeriyê. Derbarê kar û xebata Şaredariya Gel ya kantona Hesekê û projeyên wan yên îsal, Hevseroka Şaredariya Hesekê Selwa Silêman Salih ji me re axivî.

**Projeyên ku ji bo îsal hatine hilbijartin**

Selwa Silêman behsa projeyên wan yên sala 2022`yan kir û got, gelek projeyên me di vê salê de hene, wek projeya ziftê, sererastkirina kortikên li kolanan, Serfa Sihî, devikên kenalên karîzan, kevirê şikestî, ronîkirin, enterlok( çêkirina resîfan), ya paqijiyê û ya çeksazkirina piran wek pira Tinênîr û Bêrûtî. Hin projeyên gelerî jî hene, em û gel bi hev re dibin alîkar û pêk tînin. Pereyê hati xerckirin 606 hezar û 700 dolar e.

**Projeyên ku pêkatîn û yên pêknehatîn**

Selwa da zanîn ku wan heta niha gelek projeyên ku di plana wan ya îsal de pêk anîne û hin jê jî hê pêk nanîne û axaftina xwe wiha domand: "Projeyên ku me pêk anîne wek projeya Ziftê û sererastkirina kolanan ku ew jî bi rêjeya sedê 75 pêk hatiye. Projeya enterlok û ya devikên kenalan jî sedê 100 pêk hatiye, projeya kevirê şikestî jî bi rêjeya sedê 5 û ya pira Tinênîr jî sedê 75 pêk hatiye. Jixwe proje û pêngavên me yên ji bo paqijiyê jî berdewamin. Projeyên ku heta niha pêk nehatine jî, wek projeya serf sihî û hin pirên li bajêr. Herwiha got, îsal me giranî da projeya ziftê, lewra pêwîstiya gelek rê û kolnên li bajêr bi ziftkirinê hebû."

**Projeyên herî girîng û balkêş**

Selwa diyar kir ku tevayiya projeyên ku pêk tên ji bo xizmeta civakê ne û got, Projeya Ziftê û ya ronîkirina kolanên sereke ji projeyên herî girîng û balkêş in. Ji bilî wê jî projeya paqijiyê ji bo bajêr girîngiyeke mezin bû, ji ber ku di dema dawî de gelek qirêjî li bajarê Hesekê çêbûbû û ev qirêjî jî dibû sedema gelek nexweşiyan. Ji bo wê jî niha rojê sê caran paqijî li nava bajêr tê kirin.

**`Emê hewl bidin tevayiya projeyan di dawiya salê de bi dawî bikin`**

Selwa ji bo pêkanîna projeyên mayîn û bidawîkirina wan jî wiha



got: "Tevî derfetên kêm û êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li ser herêmêma me tê kirin, xebata me berdewam e. Herwiha got, Emê projeyên ku hê pêk nehatine pêk bînin û hewl bidin ku di dawiya salê de tevayiya projeyan bi dawî bikin. Da ku em dest bi haziriya projeyên saleke nû bikin."

Selwa destnîşan kir ku ew zehmetiyan di milê alav û amûran de dibînin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Ji ber ku piraniya alavên me kevin bûne û gelek caran jî xirab dibin ji bo wê em astengiyan di milê kar de dikşînin."

Selwa Silêman Salih di dawiya axaftina xwe de got, em bihêvîne ku gel, sazî û komînên me di her alî de bi me re alîkarbin. Bi taybet di milê paqijiyê de. Herwiha li gorî perspektîf û biryarên Şaredariya tev bigerin.

# Bîranînên zarokekî ku 24 saetan jiyaye

**Imran Yûsif**

**Roja daîkya min hate kuştin, ez di wê rojê de ji dayîk bûm. Ez li ber awazên dengê dilê wê xilmaş bûm, dema moşekek ji ezman ket û ez ji malzaroka wê ya gerim avêtim jiyanê.. Min guman kir ku hemû zarok bi vî awayî ji dayik dibin, bi moşekan nafkên wan dibirin, piştre dayikên wan koç dikin û ji wan dûr dikevin ….**

Di saeta pêşî de min bêhina dayîka xwe wenda kir, ew bêhina ku neh mehan perçak ji min bûye.

Xulekên wê seatê mîna sedsalekê bi giranî derbas bûn, di wan kêliyan de min dijwartirîn hestên tenêtiyê jiyan kirin.

Dema ez derbasî seata duyem ji temenê xwe bûm, hestekî birçîbûnê beziya min. Berî niha, dema ez di malzaroka diya xwe de bûm, min hestekî wisa jiyan nekiribû. Bi hemû hêz û taqeta ku diya min berî koçberiya xwe di min de hêlabû, di min de hêlabû, min dest bi girî kir. Bi giriyekî bê sûd û encam, min ew saeta dirêj derbas kir, hin bi hin birçîbûnê bi pencên xwe hinava min dixwar.

Di saeta sêyem de, ez ji sitemkariya vê jiyana bêbext û ji wê moşeka xedar ya ku ez ji malzoka dêya min dûr xistim, pir hêrs bûm.

Di saeta çarem de, xemgîniyeke bêhempa dilê min dagîr kir û bêhêviyeke mêrkuj min desteser kir.

Di saeta pêncem de hizira xwekuştinê hate min, da ku ez ji zordestiya vê jiyanê rizgar bibim. Lê awayên pêkanîna vê xwestekê bi dest min neketin û



ez ji xweşbûna vê bijardeyê bêpar mam.

Di saeta şeşem de, dîtina dêya min ya ku min ew nedîtiye bû, hemû daxwaz û hêviya min.

Di saeta heftem de, hemû hest û niyaz ji min çûn û li şûna wan tenê bêrîkirineke pir mezin, dijwar û êşdar ji diya min re, konê xwe di hundirê min de vegirt

Di saeta heştem de, ez ji hiş ketim, min yekem û dawî xewn di jiyana xwe de dît. Ew xewn mîna rûyê dêya min zelal û bedew bûye. Min berê xwe bi ezman vekir û ez qêriyam:

Xwedêyo, ez naxwazim bijîm da ku şahiya rojbûna min nebe bîranîna mirina dayika min …

Xwedêyo ez dayika xwe dixwazim.

Di saeta 24'an de, min xwe dît ez kalekim û di hembêza dêya xwe de digirîm.

(Ji çîroka zarokê bi navê Wanyar Rihman ku dayika wî ji ber toparana rîjîma Îranê ya ser herêmên Başûrê Kurdistanê ya di 28 meha Îlonê de, jiyana xwe ji dest û ew hat jiyanê û piştî 24 seatan wî jî jiyana xwe ji dest da)



# HPG : 10 leşkerên dagîrker yên artêşa Tirk hatin cezakirin

HPG'ê diyar kir ku di 8 çalakiyên gerîlayên azadiya Kurdistanê de,10 leşkerên dagirker ên artêşa Tirk hatine cezakirin û got, artêşa Tirk ya dagirker Qadên Berxwedanê 31 caran bombe kiriye

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku di 8 çalakiyên hêzên wan de herî kêm 10 dagirker hatine cezakirin. Herwiha da zanîn ku artêşa Tirk ya dagirker Qadên Berxwedanê 31 caran bi bombeyên qedexe, çekên kîmyewî û gaza îsotê, 2 caran bi balefirên şer, 50 caran bi helîkopterên êrîşê, bi dehan caran jî bi obus, hawan û tankan bombe kiriye. HPG'ê ragehand ku hatiye tespîtkirin ku çekên kîmyewî yên li çeperên şer ên Şehîd Serxwebûn a li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê hatiye bikaranîn çêja wan şîrîn û bêhna wê jî giran e.

Agahiyên li ser çalakiyan hatin dayîn wiha ne:

Di 29'ê Îlonê de dagirkeran dema ku xwestine têkevin çeperên şer ên Şehîd Serxwebûn a Qada Berxwedanê ya Çemçoyê, 3 caran bi taktîka sabotajê li wan hatiye xistin. Di van çalakiyan de herî kêm 5 dagirker hatine cezakirin.

Di 2'ê Îlonê de saet di 08.40'an de tîmên me yên gerok bi sûîkastê li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê dane. Di vê çalakiyê de 2 dagirker hatine cezakirin.

Di 2'ê Cotmehê de saet di 08.30'an de dagirker dema ku li dora çeperên şer ên Şehîd Agir a li Qada Berxwedanê ya Sîdayê tevgeriyane, bi taktîka sûîkastê li dagirkeran hate xistin û dagirkerek hate cezakirin.

Di 2'ê Cotmehê de saet di 16.20'an de tîmên me yên gerok bi çekên giran li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê dane û dagirkerek hate cezakirin.

Di 2'ê Cotmehê de saet di 16.00'an de dema ku dagirker li dora çeperên şer ên Şehîd Agir a Qada Berxwedanê ya Sîdayê ketine tevgerê, hêzên me bi çekên giran li wan dane. Li vir dagirkerek hate cezakirin.

Di 1'ê Cotmehê de bi şev dema



ku helîkopterên Skorsky xwestine leşkeran deyne Qada Berxwedanê ya Girê Amêdiyê hêzên me li helîkopterê dane. Ji ber lêdana xurt a hêzên me helîkopter bêyî ku leşkeran deyne, neçar maye ji qadê derkeve.

# HRE`yê şehadeta Zanyar Xelîl ragihand

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Hêzên Rizgariya Efrînê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku şervanê wan Zanyar Xelîl (Zinar Efrîn) di 2`yê Cotmehê de dema li ser erkê xwe, gihîştiye şehadetê.**

Daxuyaniya Hêzên Rizgariya Efrînê de hat diyar kirin ku rêhevalê wan Zanyar Xelil dema li ser erkê xwe di encema qirîza dil de şehît ketiye û got, emê şopdarên rêya şehidê xwe bin û soza me jî wê serkeftina tekoşina azadiyê be

Daxuyaniya HRE ya têkildarî mijarê wiha ye:

"Rêhevalê me Zinar Efrîn roja 2'yê Cotmehê dema li ser erka xwe bû, di encama qrîza dil de gihîşt şehadetê.

Rêheval Zinar ji bajarê Efrînê ye ku bi nirxên xwe yên Kurdayetîyê girêdayî ye mezin bûye. Çanda welatparêziyê a malbatê û derdorê wî li ser rêhevalê me Zinar jî bi awayekî berbiçav bandor kiriye. Yek ji berxwedêr û têkoşerê Berxwedana Serdemê a Efrînê rêheval Zinar, çawa ku baya Şoreşa Rojava a ku mirovên dilê wî ji bo azadîyê lê dida bandor kir ew jî ji vê bayê bandor bû. Rêheval Zinar bi ruhê ciwantîyê tev li xebatên şoreşê bû. Di rojên reş û tarî, di demên tengasiyê de xwe neda kêlekê û cihê xwe eniya pêş da girt. Berpirsyartîyên xwe yên li hember gel û erkên neteweyî ên parastina welatê xwe di dem û wextê xwe da pêk anî. Her tim êşa gelê xwe êşa xwe hîs kir û ji bo rizgarkirina bajarê Efrînê hertim amade bû. Lê mixabin dilê wî yê mezin zêde li ber xwe neda.

Her çi qas me bi fîzîkî rêhevalên xwe wenda kiribe jî me wana spartiye dilê xwe û bi ruhê wan ê zindî meşa xwe ya azadîyê




bimeşînin. Em wek rêhevalên Zinar û şopdarên lehengên xwe di wê îdia û biryarê de ne ku wê rojekê hemû hevîyên wan pêk bînin. Soza me wê serkeftina me be. Em di serî da sersaxîyê ji malbata şehîdê xwe re û gelê xwe yê birûmet re dixwazin.

Nasnameya hevrêyê me yê şehîd wiha ye;

Nasnav: Zinar Efrîn

Nav û Paşnav: Zanyar Xelîl

Navê Dayikê: Fîdan

Navê Bav: Ismet

Cih û Dîroka Şehadetê: 2'yê Cotmeha 2022."

# Qêrîna edaletê ya 575 rojan

**Navenda nûçeyan**

**Malbata Şenyaşar ew 575 roj in ji bo edaletê di nobedê de ye û êdî malbat dibêje, ji ber ku edalet nîne, zilm dewam dike. Lê di dîrokê de ti pergal bi zilmê li ser piyan nemayîne.**

Çalakiya Nobeta Edaletê ya malbata Şenyaşar di 9'ê Adara 2021'ê de li pêşiya Edliyeya Rihayê dest pê kir. Nobet îro di roja 575'an de di dome. Emîne Şenyaşar ji ber pirsgirêkên xwe yên tenduristiyê çalakiya xwe li mala xwe ya li navçeya Pirsûsê dewam dike. Ferît Şenyaşar jî serê sibehê li meydana ku weke "Quncika edaletê ya malbata Şenyaşar" tê binavkirin, dest bi nobetê kir. Şenyaşar pankarta "Ji bo malbata Şenyaşar edalet, ji bo her kesî edalet" bi blokên betonê yên li ber deriyê edliyeyê ve daliqand.

Malbatê li ser hesabê xwe yê medyaya dîjîtal, bi etîketa "Meşa Mezin" ev peyam parve kir: "Edalet nikare kesên binaxbûne bi paş ve bîne,



lê ji wijdanê birîndar bûyî re dibe melhem. Ji ber ku edalet nîne, zilm dewam dike. Heya niha ma di dîrokê de kîjan pergal bi zilmê li ser piyan maye!"

# KCK'ê Mam Celal bi bîr anî

**KCK'ê di salvegera 5'an a wefata Serokê YNK'ê Celal Talebanî de ew bi bîr anî û got, Ji her demê bêhtir pêwîstiya me bi kesayetên niştîmanî û netewî yên mîna Serok Mam Celal ê xwedî kêrhatiyên siyasî û dîplomasî, hunera aştiyê û diyalogê heye.**

Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) di salvegera 5'an a wefata Serokkomarê berê yê Iraqê û Serokê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) de Mam Celal bi bîr anî.

Daxuyaniya KCK'ê wiha ye:

"Birayê birêz Bafil Celal Talebanî Birayên birêz ên Buroya Siyasî



û Meclîsa Serkokatiya Yekîtiya Nîştîmanî ya Kurdistanê (YNK);

Di salvegera 5'an a koça dawî ya Serokkomarê Iraqê, Sekreterê Giştî yê Yekîtî Nîştîmanî ya Kurdistanê (YNK) Serok Mam Celal Talebanî de bi rêzdarî vî têkoşerî bi bîr tînin û têkoşîn û xebata wî mezin û pîroz dibînin.

Serok Mam Celal Talebanî weke pêşeng û têkoşerek kêrhatî, dîsa weke siyasetmedar, kesayetek niştîmanperwer hem li sedsala 20'an û hem jî sedsala 21'an mohra xwe li dîroka xebat û têkoşîna gelê Kurd daye. Bê guman kesayetek niştîmanperwer û têkoşer weke Mam Celal ne tenê ji bo Başûrê Kurdistanê, ji bo hemû parçeyên din ên Kurdistanê xwedî rol û bandor bû. Bi taybet hevrêtî û dostaniya di navbera serok Mam Celal, Serok Apo û Mamoste Îbrahîm Ehmed de rê li ber bidestxistina destketiyên netewî û niştîmanî ya ji bo çar parçeyên Kurdistanê vekiriye, semboleke ji bo yekîtiya netewî ya Kurd e. Di demekê de ku Serok Mam Celal ji bo bîranîn û xatirê wê hevaltiyê amadekariyek ji bo lidarxistina konferanseke navneteweyî ya ji bo azadiya Rêber Apo dikir de, nexweş bû.

Di vê pêvajoya ku hemû beşên Kurdistanê di bin êrîşên dagirkeriyê de ne, di qonaxeke dijwar de derbas dibe, hemû Rojhilata Navîn û bi taybet Iraq di warê siyasî û civakî de di nava krîz û kaosên mezin de ye, ji hemû demê zêdetir îro pêwîstî bi kesayetên netewî û niştîmanî yên mîna Serok Mam Celal ê xwedî kêrhatiyeke siyasî û dîplomasî, dîsa hunerê aştiyê û diyalogê heye.

Bi hêviya ku bîranîn û daxwazên Serok Mam Celal bibe sedemê pêkhatina yekîtiya netewî û rabûna li ber êrîşên dagirkeriyê yên li ser Kurdistanê."

***ANF***

# Karayilan: Berxwedana 160 rojan bingeha Serkeftina Mezin danî

**Fermandarê Biryargeha NPG'ê Mûrat Karayilan diyar kir ku berxwedana 160 rojên ya derbasbûyî, bingeha serketina mezin daniye û got, kesên ku ewqas berxwedanî dikin ne gengaze ku bisernekevin.**

Navenda nûçeyan

Fermandarê Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) Mûrat Karayilan ji gerîlayên li Zap, Avaşîn û Metînayê re 2'ê mehê li ser cîhaz axivî û li ser Gerîla TV hate weşandin.

Mûrat Karaylan diyar kir ku di dîroka berxwedana Apogeriyê de peleke nû hat vekirin û wiha got: "Li hember êrîşa dijmin berxwedana pîroz îro 160 rojên xwe temam kir. Di vê serdemê de, di dîroka têkoşîna me de, di dîroka berxwedana Apogeriyê de peleke nû hat vekirin, dîrokek nû hat avakirin. Ev bi xwîn û berxwedana şehîdên qehreman pêk hatiye. Weke tê zanîn hedefa dewleta Tirk a qirker û faşîst bi vê êrîşî re ew e ku tevahî Tevgera Azadiya Kurdistanê bi temamî tesfiye bike û destketiyên gelê Kurd ji holê rake."

### Ne çekên kîmyewî ne jî yên nukileer nikarin bandorê li ser şêwazên tunelên me çêbikin

Karaylan da zanîn ku tevayaya çekên kîmiyayî li hemberî rêbazê wan yê tunelan ger bê bandore û wiha domand: "Ne çekên kîmyawî ne jî yên nukler, nikarin bandorê li ser şêwazên tunelên me çêbikin. Bêguman divê ku mirov tedbîr bigre. Ya din jî tedbîra herî girîng di şerê tunelan de, divê ku derî û pencereyên wan bikaribin hev biparêzin. Esas tedbîra herî girîng ev e. Dema ku tunelek bikaribe tunelek dîtir biparêze, an jî heman tunel deriyên wê bikaribin hev biparêzin, ji xwe dijmin wê nikaribe zirarekî cidî bide wan tunelan."

### 'PDK ji her alîve bû alîkarê û rêdanê artêşa dewleta dagîrker'

Karaylan da xuyakirin ku dagîrkeriya tirkî hebûna xwe di têkbirina Tevgera Azadiyê de dibîne û wiha got: "Vê rejîmê hebûna xwe li ser têkbirina me, ango tinekirina me ava kiriye. Ji bona wê, wan par xwestin derbeyek bingehîn li me bixin û biçin hilbijartinê, lê par nebû. Îsal xwe zêdetir amadekirin, piştevaniya derve girtin û hîn zêde ji bo PDK destek xurt bike û beşdar bibe; hewildan pêşxistin. Ji xwe PDK jî li gor par zêdetir



beşdar bû. Mînak; herî dawî weke we jî dîtî li Girê Amediyê rê çêkir, niha qereqol çêdike, me dît ku li Kurêjehro rê vekirin ku dijmin di erazî de biçe. Bangîna xwe û beşdarbûna xwe zêdetir xurt kirin."

### Partiyeke siyasî ku ji xwe re dibêje 'Kurd im' çawa dikare sîxuriyê bike!

Karaylan balkişand ser sîxuriya hin partiyên siyasî yên dibêjin em Kurd in û wiha got: "Ji bo ku li hemberî me bi ser bikeve, faşîzma tarî dixwaze xwe mayînde bike. Lê berxwedana heya niha eşkere kir ku ev planên AKP-MHP'ê bi ser nakeve û wê nekaribe bi ser bikeve jî. Lê belê, dijmin hîna jî hewildana xwe berdewam dike. Niha dewleta Tirkiyê dixwaze li Bakur, Başûr, Rojava û li her derî bi faliyetên îstîxbaratê di nav civaka Kurd de bê ehlaqî, bê rûmetî pêşbixe. Sîxûriyê tevger bike û niha dixwaze li Başûr herkesî bi sîxûrî tevger bike. Başe; çawa dibe ku partiyekî siyasî ku dibêje 'ez Kurdim' bibe sîxûrê dijminê gelê xwe! Mixabin niha wisa pêş dixin. Ango hem partiyek siyasî ye hem jî sîxûriyê dimeşîne; sîxûriyê tevger dike."

Karaylan destnîşan kir ku bi keda şehîdên qehreman êrişên dagîrkeriya tirkî têk diçin û wiha domand: " Li Zap, Avaşîn, Metîna, Girê Cudî, Girê FM, Girê



Amediyê; şerê heya niha hatî meşandin di dîroka Kurdistanê û di dîroka têkoşîna me de tiştek nû ye. Bêguman ev bi keda şehîdên qehreman û we hevalên niha di hindirê berxwedanê de pêk hatiye. Em dizanin, lê divê ku herkes bizanibe, bi hêsanî pêk nehatiye. Bi fedekariyek pir mezin, bi cesaret, bi berxwedaniyek pir mezin ve encex pêk hatiye."

### Yên ku di vê astê de li ber xwe didin, ne mumkun e ku bi ser nekevin

Karaylan da zanîn ku kesên eqas berxwedanê bikin tu carî têk naçin û wiha got: "Hevalên ku heya niha di vê astê de ev berxwedanî pêşxistin, dikarin ji hemû pirsgirêkan re bibin bersiv. Hevalên di vê serdemê de li hemberî van zorî û zehmetiyan, berxwedana pîroz bilind kirin, bi rihê Apogerî tevgerîn û ew jêhatîbûn raber kirin, di wan de ew qûdret heye ku ji hemû zehmetiyan re jî bibin bersiv. Tenê divê ku, di vê derheqê de fikir û felsefeya Rêber Apo hertim esas bê girtin, rihê rêhevaltiyê, jiyana şoreşgertiyê, li ser hîmê xeta azadiya jin bê parastin. Heval ji heval hez bike, heval ji heval re alîkar be. Rihê kolektif bilind be, di vê çarçovê de divê herkes li erkê xwe xwedî derkeve. Ango erka xwe ya hevaltiyê, hevaltiya xwe ya bi Rêber Apo re, ya bi hevalê xwer re xwedî derkeve. Di vê derheqê de tiştên pêwîst bike. Ger ku wisa bibe; kesên ku ewqas berxwedayî û li ser vî esasî kur bibe, ne mimkûne ku bisernekeve."

### Berxwedana 160 rojî bingeha serketina mezin daniye

Fermandarê Biryargeha NPG'ê Mûrat Karayilan da xuyakirin ku di van 160 rojên derbasbûyî de gerîlayan berxwedan pêş xistin û wiha got: "Eger ji tecrubeyên heya niha derketin holê, em sûd werbigrin û li ser vî esasî di rê û rêbazê rast, di xeta Rêber Apo, di rihê Apogerî de, kûranî çêbikin, rê û rêbazên taktîkên afrîner hîn zêde kûr bikin, zafer teqez wê ya berxwedanvanên qehreman be. Serkeftin wê ya fedayiyên Rêber Apo be. Ev hatiye heqkirin."

# Komîteya Jinan a Meclisa Malbatên Şehîdan: Emê asta têkoşînê bilind bikin

Navenda nûçeyan

**Komîteya Jinan ya Meclisa Malbatên Şehîdan tecrîda li Îmraliyê şermezar kir û got, Komploya Navneteweyî ya li ser Rêber Apo hat pêkanîn,heta vê kêliyê berdewam dike. Herwiha soza şopandina xeta şehîd Rûken û Sara û tevahî şehîdan heta pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo da.**

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Komîteya Jinan a Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo bi daxuyaniyekê tecrîda li ser Rêber Apo şermezar kir û serhildana jinan ya li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê silav kir.

Komîteya Jinan a Meclisa Malbatên Şehîdan di daxuyaniya xwe de diyar kir ku armanca bingehîn ji tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan ew e ku nêrîn û têkiliyên wî bi gel re qut bike û got: "Ev 18 meh e der heqê rewşa Rêber Apo de tu nayê nayên girtin û tevahî hewldanên parêzeran ên hevdîtinê têne astengkirin. Em tecrîda domdar a li ser rêber Apo şermezar dikin û bêdengiya hêzên berpirs wekî sûcekî exlaqî û dijmirovî dibînin."

Komîteya Jinan a Meclisa Malbatên Şehîdan da xuyakirinKomploya 9 Cotmehheta niha dewam dike û wiha got: "Em dikevin meha Cotmehê ku Komploya Navneteweyî li ser rêber Apo hat pêkanîn, em dibînin ku bi pêşxistina tecrîdê û zextên li ser girtiyan ev komplo heta vê kêliyê berdewam dike."

Komîteyê balkişand ser serhildana li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê û wiha got: "Piştî qetilkirina Jîna Emînî, rejîma Îranê di kesayeta wê de hewl da îradeya jinan bişikînin, em dibînin ku li erdnîgariya Rojhilatê Kurdistanê serhildanên berfireh rabûne."

Komîteya Jinan a Meclisa Malbatên Şehîdan da zînîn ku têkoşîna jinên Rojhilatê Kurdistanê ji bo tevahî azadîxwazên cîhanê cihê rêzdariyê ye û daxuyaniya xwe wiha qe-



dand: "Bi rihê Sara, Rûken û hemû şehîdan em ê asta têkoşînê bilind bikin heta ku rêber Ocalan û civak azad bibin."



# 'Pêwîste her jinek bibe çirûska serhildanê'

**Fermandara YPJ'ê Dilovan Gever diyar kir ku fikrê Rêber Apo çavên jinan ji nûve vekir û got, slogana jinên tolhildêr 'JIN JIYAN AZADÎ' wê bibe qîrîna tevayiya jinan û di guhê desthiladaran de bimene.**

Şaho Gabar / Qamişlo

Di dîrokê de ji ber êrîşên dagîrkeran, gelê Kurd herdem bi tenê bi berxwdanê karîbû hebûna xwe bidomînin. Yên herî zêde ji êrişên dagîrkeran zerar dîtin jin bûn. Ji ber wê jî, jinan ji bo parastina xwe û parastina civakê roleke pêşeng lîstine. Bi sedan nimûneyên bi vî awayî li çar parçeyên Kurdistanê hene; Deyfe Xatûn, Fate Reş, Zerîfe, Besê, Qedemxêr, Adîlexan û Leyla Qasim tenê çend nimûneyên tên zanîn û hatine bihîstinin.

Derbarê mijarê de, yek ji fermandarên Yekîneyên Parastina Jin ya YPJ'ê Dilovan Gever ji rojname ya me re axivî.

Dilovan Gever diyar kir ku Potansiyela ku hêzên desthiladar di civakê de jê ditirse jine û wiha got: " Jin civakê li ser lingan dihêle û hemû berhemên civakê û mirovahiyê diparêze. Bi hezaran sal ku di reveberî, peşketin û zanista civakê de roleke mezin leyistiye. Taybetmendiyên paras-



Jinên Kurd ji nîva sedsala 20'an û vir ve bi rêbazên cuda di nava parastinê de cih girtine, ji bo parastina xak, welat, ziman û çand têkoşîneke bê hempa dimeşîne û li dijî zihniyeta desthilatdar û çanda tundiya mêr ya dewletperest, xwe bi rêxistin kiriye û parastina rewa ya jinan dikin. Hin mînakên wê yên ber çav jî ; YJA Star, YPJ , YPS jin, YJŞ û hwd.

tina ax, wekhevî, çand û exlaqê civakê bi xwe re anîye heta roja me ya îro û derbasî nifşên nû kiriye. Gelek mînakên jinên kurd yên wekî Leyla Kasim, Sakîna Cansiz, Zîlan, Bêritan û hwd. ku bi qehremantiya xwe dîrok naqişandin û her yek ji wan bûn gavên peşxistina xeta jina Kurd ya lehengiyê. Îro jî, şoreşa Rojava ya ku bi şoreşa jinê tê penase kirin, bi peşengtîya jina welatparêz ku li hemberî sîstemên desthiladar derket, serî netewand û destkeftiyên mezin qezenc kirin."

### 'YPJ'ê hêza parastina jina û pêşenga civakê ye'

Dilovan Gever da zanîn ku Yekîneyên Parastyina Jin YPJe bi hêza cewherî xwe birêxistin dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "YPJ'ê xweparastinê wekî felsefeyekê digre dest û ji bo ku bibe peşengeke rast ya civakê, di hemû aliyan de xwe perwerde dike û li ser esasê parastina rewa, parastina xak û jinan dike. YPJ'ê, ji bo ku bibe hêza tolhildanê ya jinan, bi peşengtîya lehengên wek Arîn Mîrkan, Rêvan Rojava, Silava' yan û heta Jîyan Tolhildan'an bûne hêza fedayî ya gelê xwe. YPJ ne tene di parastina gel û axê de cih digrin, herwiha tekoşînekî mezin ye di aliyê civakî, çandî, exlaqî û polîtîka de jî dike. Bi peşengtiya jinê, guhertinên mezin di şoreşa Rojava de çêbûn û şoreş vegeriya şoreşa jinê."

### 'YJA Star ji me re bû çavkaniya hêz û ilhamê'

Dilovan Gever da xuyakirin ku wan hêz û ilhama xwe ji Tevgera Azadiya Jinan YJA Star girtiye û wiha domand: "Di avakirina YPJ'ê de, yên ku ji me re bûne çavkaniya hêz û îlhamê, Tevgera Azadîya Jin YJA Star e. Ji ber ku wan bi dehan



salan li hemberî dagirkeriyê şer kirin û li berxwedan. Ew bi tecrûbeya xwe ya şer, tekoşîn, rexistinbûn û avakirina pergala xweser ye jinan de jî, bune xwedî kedekî pir mezin. Ji destpêka şoreşa Rojava ve, wan bi rihekî fedayî xwe gîhandin gel û pêşîya komkujiyan girtin. Herwiha ji bo parastina gelê Rojava gelek şervanên YJA Star bi lehengî şehîd bûne, gelek ji wan jî, birîndar bûne û perçeyên laşê xwe fedayî gel kirine."

### 'Bi fikir û felsefeya Reber Apo jin û civakê ji nû ve çavên xwe li jiyanê vekirin'

Dilovan Gever balkişand ser Xeta Rêbere Apo ya peşxistina azadîy jinê û wiha got: "Di dîrokê de û heta niha, tu serokekî ku bi qasî Reber Apo, jin ewqas kûr digre dest û zanebuna jinê derxistiye holê, derneketiye. Bi saya fikir û felsefeya Reber Apo jin û civakê, ji nû ve çavên xwe li jiyanê vekirin. Fikrê Rebertî derfet da ku jin bibe ya xwe û li pey dîroka xwe ya ku hatiye înkarkirin û windakirin, bikeve. îro jî di bin felsefeya Rêber Apo de, bi hezaran jin xwe rexistin dikin, perwerde dikin, serî radikin û li pey mafê hebûna xwe ya hatiye windakirin têkoşînê dikin. Li Rojava jî, bi keda Rêber Apo, jinan di tevayiya qadan de cihê xwe girtine"

### Leyla Qasim: Wê rojek bê jin dê bi porê xwe ala azadîye rakin

Fermandera Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê Dilovan Gever da zanîn ku Şoreşa Rojava ya jinê bûye nûmuneyekî ji hemu jinên cîhanê re û axaftina xwe wiha qedand : "Silogana 'JIN JÎYAN AZADÎ' buye slogana hemû jin û kesên azadîxwaz. Ev jî îspata bandoriya YPJ''ê ya li ser azadîxwazên cêhanê ye. Qîrkirina serhildêrên Îranê bi slogana 'JIN JIYAN AZADÎ' bandoriya YPJ'ê ya li ser jinan nîşan dide. Ev jinen ku carekê, çavê wan vebûye û heza xwe naskirine careke din tu zilam û hêz nikare çavên wan bigre û wan bê hêz bike. Îro wesiyeta Leyla Qasim pek tê, wê gotibû, 'Wê rojeke wisa dê were ku jin bi porê xwe ala azadîye rakin" ew roj îro ye. Slogana jinên tolhildêr 'JIN JIYAN AZADÎ' wê bibe qêrînên hamû jinan û wê gûhê zîlamên desthilatdar da bimene. Ji bo wê dem ew deme ku her jinek bibe çiruska serhildanê".

# Çeteyên dagirkeriya Tirk wekaletên rêvebirina milkên koçberan betal dikin

**Çavkaniyên ji Efrînê ragihand ku çeteyên dagirkeriya Tirk bacên nû, li şêniyên Efrîna dagirkirî ferz kirine û ji bo desteserkirina mal û milkên koçberên Efrînê, wekaletên birêvebirina mal û milkên koçberan ku ji aliyê xizmên wan ên li herêmê ve tê kirin, betal kirine.**

Her sal bi destpêkirina werza zeytûnan re çeteyên dewleta Tirk a dagirker berhemên şêniyên Efrîna dagirkirî yên xwedî darên zeytûnan, talan dikin.

Têkildarî mijarê çavkaniyên ji Efrînê ya dagirkirî (ji ber tirsa ku ji aliyê çeteyan ve bê revandin navên xwe eşkere nekirin) got komîteyên bi navê "Komîteyên Meclisên Xwecih" li Efrînê û navçeyên wê yên dagirkirî, bac li ser xelkê ferz kirine, her wiha ji bo desteserkirina mal û milkên koçberên Efrînê, hin wekaletên birêvebirina mal û milkên koçberan ku ji aliyê xizmên wan ên li herêmê ve tê kirin, betal kirine.

Çavkaniyan destnîşan kir ku "Meclisên Xwecih" yên dewleta Tirk a dagirker hin endamên xwe erkdar kirine ku bi şêniyên gund û navçeyan re civînan li dar bixin. Ev civîn jî ji bo derxistina girêbestên nû yên xwedîtiyê bi şertê ku xwediyê milk bi xwe were da ku girêbestê nû bike. Ev jî bi mebesta zanîna hejmara darên zeytûnan



ên koçberên Efrînê tê kirin da ku dest deynin ser berhemên wan.

Koçberên Efrînê ji ber berdewama tawanên li dijî Kurdan ên li wir, wekî kuştin, revandin, îşkencekirin û destavêtinê, red dikin ku vegerin kantona dagirkirî.

Çavkaniyan diyar kir ku çekdaran ji sedî 20 bac li ser berhemên xelkê Efrîna dagirkirî ferz kiriye. Her wiha ji sedî 40 li ser berhemên koçberên Efrînê yên ku li Şehbayê dimînin, ferz kirine. Kesên ku vê biryara qaşo binpê bike yan jî dayîna bacê red bike, dê bi aqûbeteke nediyar re rû bi rû bimîne.

### NÛKIRINA RUXSETAN BI BUHAYEKÎ ZÊDE

Çavkaniyan têkildarî kargeha guvaştina zeytûnan û bazirganên zeytê yên li Efrîna dagirkirî jî got: "Li Efrînê bi navê "Odeya Çandiniyê" 250 dolar bac ji bo nûkirina destûra karê kargeha guvaştina zeytûnan û 350 dolar jî dema ku dest bi kar bike, ferz kir. Ji bo kargehên guvaştina zeytûnan ê nû ku dê cara yekem bên xebitandin, dê 800 dolar li ser wan were ferzkirin. Derbarê bazirganan de jî, beramberî wergirtina ruxseta bazirganiyê 350 dolar bac hat dayîn.

Her wiha çavkaniyan got: "Em ji dizî û talankirina çeteyan êş û azaran dikişînin." *ANHA*